tistê herî xemgîn û cihê daxê ye ku ev dewleta faşîst di bin sîwana bêdengiya cîhanê de û di çerxa bîst û yekê de dike. lê pêwîst e ji hêla her kes ve îro were zanîn ku miletê Kurd li Kurdistan û Rojhilata Navîn peymana Saykis Bîko têk biriye û kesê vê rastiyê nebîne xwe dixapîne û bêguman dê poşman jî bibe. îro Kurd xwedan rêxistin. hêz û raman e û bêyî Kurdan tiştek çareser nabe. çi li ser asta navherêmî û çi li ser asta navnetewî û ew qedera ku li ser gelê me hate ferzkirin îro biberxwedan û têkoşîna xwe têkşkand. Kurdistan her dem di dîrokê de welatê rojê bû. ji ber vê çendê ew tucarî di jiyanê de nayê tunekirin û ji holê nayê rakirin. careke din em bi hêvî ne ku ev rastî ji hêla her kesî ve were dîtin. çimkî Kurdistan di kûrahiya dîrokê de ji bo hemi mirovahiyê welatê xwedawenda bû. cara yekem li bajarê Orfayê li ser destê Ibrahîm Elxelîl rûgeha miroatiyê di warê olî de tê naskirin. Li ser dema îro jî gelê Kurd pêsengiya şoreşa demoqratiyê dike. îro xort û keçên Kurd li şûna û ji bo hemî mirovahiyê canê xwe kirine mertal û her kesî diparêz li himber tîrora hov û dirinde.

bi vî awayî careke din dîrok li xwedanê xwe vedigere. lê vê carê dam û dezgehên dîrokê ji destê xwe nema berdide. çimkî ji her kesî pêtir gelê Kurd dikare nirxên mirovatiyê biparêze. li ser vê bingehê Saykis Bîko dirize û hêmanên nû tên avakirin ji ber ku Firensa û Engeltera bi xwe çi rola wan li ser asta navnetewî bi bandor nemaye lewra hemî pilanên wan jî roj bi roj têk diçin. îro Kurdistan û Rojhilata Navîn ji bo jiyaneke nû tê amadekirin û Kurd tê de hêmana sereke rola xwe dilîze . bi vê helkevtina giring di jiyana gelê Kurd de ku di 16 vê meha Gulana têper dibe sed sal di ser wê peymana rûres û bedyom re derbas dibe. pêwîst e netewa Kurd seranser di vê rojê de ji mala xwe derkeve û rêkevtina mijara gotinê şermezar bike çi li Kurdistan û çi li welatên diyaspora bi meş û xwepêsandanan û banga yekrêziya gel bîne rojevê û bi dirûsmeyan were berzkirin.

Di dûmahiyê de divê ew qedera bêbext êdî li ser asîmanê welatê me Kurdistan ji hev belav bibe û ev bêguman di çarçova yekrêziya gelê Kurd de ye ku bi şêweyekî zûtirî pêwîst e kongira netewî were bestin û girêdan.

Şewitandina ARTA FM û Laneta Mirovayetiyê

" Revandin, tehdîd û şewitandin: ev qanûnên daristanan in, ev ne qanûnên şaristaniyê ne ".

Sîrwan H. Berko

"Ev tenê destpêk bû. li dever a ku mirov pirtûkan dişewitînin. wê di dawî de mirov jî bên şewitandin."

Helbestvanê elmanî Heinrich Heine ev hevok di sala 1821ê de di şanoyeke trajedî ya bi navê "Almansor" de nivîsandiye. Şewitandina Qu`ranê ji aliyê dagîrkerên mesîhî ve li Xernatayê li Spanyayê di salên 1499 / 1500 de sedema nivîsandina van peyvan bû.

Şewitandina pirtûkan di dîrokê de gelek caran pêk hatiye. Şewitandina pirtûkan a herî naskirî di 10ê gulana 1933ê de li Elmanyayê pêk hat. Di 22 bajarên ku zanîngeh lê hene de. Naziyan pirtûkên nivîskar û zanyarên cihû. markisî û yên aştîxwaz şewitandin.

Şewitandina pirtûkan tê wateya şewitandina mirovan bi awayekî ne yekser. Dema mirov keda mejî ya mirovan têk dibe. mîna ku mirov wan mirovan ne hêjayî jiyanê dibîne. Ev faşîzim bi xwe ye. Ev hovîtî ye. Tenê kesên faşîst û hov dikarin bi van karan rabin. Ji ber vê yekê ev kes dibin beşek ji dîroka hovîtiyê ya mirovan. Hestek çawa ye ku mirov bibe beşek ji dîroka hovîtiyê?

Dibe ku ew kesên ku di tarîşeva 26ê nîsana 2016ê de navenda ARTA FM li Amûdê şewitandibin bikaribin bersiva vê pirsê bidin. Ew kesên ku bi vî karî rabûn. dijminê çanda mirovane ne. Ew dijminên azadiyê ne. dijminên mirovê azad in. dijminê civaka azad in.

Şewitandina navendeke ragihandinê li Rojava tê wateya dijminayetiya Rojava jî. Ev devera ku em dixwazin bibin devereke nimûne ji bo tevaya Sûriyê. Ev devera ku bi hezaran ji keç û xortên wê ji bo hebûn û aramiya wê şehîd ketine.

Rojava nikare bibe devereke nimûne û ya xwedî systemeke demoqrat ku ragihandin tê de ne azad be. Pejirandina navneteweyî û piştgiriya Rojava girêdayî ye bi peydakirina zemîneke xurt ji bo azadiyan û mafên mirovan. Evyek divê zelal be. Şerê li dijî terorê heta hetayê dirêj nake. Û alîkariya ku îroj digihê Rojava. wê ne ji bo hertim be. ger rê li ber binpêkirinên mafên mirovan neyê girtin û azadiya nerîn û ragihandinê neyê misogerkirin. Şewitandina navenda ARTA derbeyeke mezin bû li dijî berjewendiyên Rojava. Kesên li dû vê kiryarê ne dilsozên Rojava ne. belkû dijminên Rojava û aramiya Rojava ne. Divê ev yek zelal be.

Berpirsyariya Birêveberiya Xweser û dezgehên wê yên ewlekariyê yê ku rê li ber van kiryaran bigire. Berpirsyariya Birêveberiya Xweser e ku endam û karmendên xwe hîn bike di warê rêzgirtina mafên mirovan û azadiyên giştî de. Her kesek ku li Rojava dijî. divê nas bike ku rêzgirtina li azadiyan û parastina wan siberojeke geş jê re misoger dike.

Revandin. tehdîd û şewitandin. ev qanûnên daristanan in. ev ne qanûnên şaristaniyê ne. Di dîrokê de gelek kesan xwestin. van qanûnan ser gelên xwe ferz bikin. Mîna Naziyên Hitler di 10ê gulana 1933ê de. dema pirtûk şewitandin. Lê piştre çi bû? Pirtûkman. nivîskar man. mejî û zansitman û bi pêş ketin. Û Hitler û Naziyên wî? Ew bûn beşek ji dîroka hovîtioyê. û mirovayetî lanetê li wan tîne.

×damezirênerê ARTA FM e û birêvebirê wê yê giştî ye.

Wê Çarenivîsa Kurdistanê Piştî Saykis-pîko Çibe?

Dilovan Çeto

Piştî serkeftina Osmaniyan di şerê navbera wan û Sefewiyan de. di cenga Çaldîranê de di sala 1514an de û bi saya alîkariya Kurdan.imperatoriya Osmanî dest danîne ser beşekî mezin ji Kurdistanê ya ku bû qiblenameya hêzên sereke di cîhanê de. ew jî ji ber zengîniya xaka Kurdistanê bi samanên siruştî û istiratîciya wê a cuxrafî di Rojhlata Navîn de.

Nêzî 500 salî imperatoriya Osmaniyan karîbû hijmareke mezin ji welatên Rojhilata Navîn dagir bike. û di heyama van sedsaliyan de. ji bilî xerakirin û paşkeftinê pê ve li şûn xwe nehişt.

Bi vê rewşa xerab û aloz imperatoriya Osmanî li gel Elmanan derbasî şerê cîhanî yê yekem bû ji sala1914-1918an û di encamê de ne serkeftî ji vî şerî derket.

di dema şerê cîhanî yê yekem de peymana Saykis-pîko di navbera welatên Ferensayê. Birîtaniya û Rûsiyayê de di 16-5-1916an de hate imzekirin û di encamê de samanên imperatoriya Osmanî li xwe parve kirin û yek ji wan xaka Kurdistanê bû.

Piştî şoreşa Belşefiyan di sala 1917an de di bin fermandariya Lînîn de. Rûsiyayê xwe ji vê peymanê vekişand û destladariya deverê bi danîna nexşeyeke nû ji herêmê re kete bin kontrola Birîtanya û Ferensayê de. û bi vê yekê doza gelê Kurd kete qûnaxeke zehmet û aloztir de. çimkî xaka Kurdistanê li gorî xalên peymana Saykis-Pîko û li gorî berjewendiyên herdû dewletan hate parçekiri. nemaze ku Rojhilatî Kurdistanê ma ji derveyî peymanê jiber welatê farisan ango dewleta Iraniyan ne di nav nexşeya peymana Saykis-Pîko de bû. lê belê ji derveyî peymanê mabû.

Eger em vegerin bi şûn de dema şerê di navbera Osmaniyan û Sefewiyan de destpêkir.herdû hêzên şer û di bin sîwana nîştimanî û rakirina ala Islamê de.leşkerên xêza pêşî di çeperên şer de. herdem ji şervanên êlên Kurdan bûn. û bi vê yekê êzingên şer û pevçûnan Kurd bûn û li ser xaka Kurdistanê ku piraniya cengan li ser wê xakê bi rê ve diçûn hevdû dikuştin.

Piştî Kemal Atatork destladariya Turkiyê girt. soz û peymanên dost û hevaltiyê ji Kurdanre diyar dikir û bi biratiya Turk û Kurdan bang dikir û bi vê yekê gerantiya berdewamiya şer ji alî şervanên Kurdan ve li kêleka leşkerên Turk. bi hesanî qezinc dikir.

Lê dema şer bi dawî hat û serkeftin hate ragihandin.Kemal Atatork riwê xwe yê resen eşkere kir û dest bi kuştin û darvekirina serbaz û rêberên Kurdan kir û Kurd dane nasîn wek Turkên çiya. herweha li Sûriyê û Iraqê jî rêjîmên destladar û pişt re partiya Elbees dest bi qirkirin û cinosaydan kirin derheqê gelê Kurd de herweha rêjîma Iranê jî şopa wan meşand û ji bilî kuştin. zindan û koçberî û derbederiyê. civaka Kurdî û tevgera siyasî ji hev belawela kirin nemaze di van salên dawî de ku peymana Saykis-Pîko ber bi dawî ve diçe.

Lê Pirsa Herî Giring Ew e:

Gelo siyasetmedarên Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê tê gihiştine ku dewletên dagirker û sitemkar pîlanên bindestiya gelê Kurd ji heyama sed salî ve hûnan dibûn û miletê Kurd di xizanî û hejariyê de jiyan dikir û ji samanên welatê xwe bê par mabû?.

Gelo ew dizanin ku sedemên berdewamiya parçebûna Kurdistanê û neyekrêziya tevgera Kurdî li her parçeyekî û li Kurdistanê bi tevayî encamên wan pîlan û peymanên dagirkerane?.

Gelo. di heyama sed salî de û bi sedan şoreş û serhildan li tevaya Kurdistanê hatin kirin.û li ser destê heman dagirkeran rêber û serokên wan serhildanan li qad û meydanên Kurdistanê hatin bi darvekirin û rûmeta Kurdayetiyê di bin lingan de hate binpêkirin. çi wane û ezmûn ji xwe re girtin?

Eger di heyama sed salî de Kurdan sûd û mifa ji waneyên dîrokê ne girtibin.û bi hizrê Mehmûdkî û Osmankî bi hev re reftaran bikin û çanda lêborîn û heskirinê fêr nebûbin. manaxwe ev gelê bê şivan ne layîqî jiyanê ye û ne hêja ye ku bibe xwedî welat.

Lê eger siyasetmedarên Kurd tê gihiştibin ku sedemên parçebûn û koçberî û xizanî û komkujiyên ku bi serê gelê Kurd hatine kirin. ji pîlanên dewletên sitemkar û nijadperestin û tevlî wilo jî mane bê deng û tenê mîna temaşevanekî li bendî perdeya şanoyê ye ku were berdan û şano bi dawî bibe bêyî ku ew jî bibe yek ji lîstikvanên şanoyê. careke dî ez dibêjim ku ev gel ne layîqî jiyanê ye û tenê bûye barek ser milê mirovahiyê.

Banga her Kurdekî îro ji hemû serok û rêber û siyasetmedarên Kurd re. xewna avakirina welatekî serbixwe û azad pir nêzîk û li ber çava ye. nemaze ku Kurdistan welatekî bi samanên siruştî û bi taybetî patrol û gaz zengîn e. herweha gelê Kurd hatiye nasîn ku miletekî mamnavendiye û şerê terorê dike û ti gefê li welatên derdorên xwe di paşerojê de wê neke. û ev yek xaleke positive e û erênî ye ji Kurdan re ku daxwaza serxwebûna welatekî serbixwe bikin.

Lê eger win vê delîveyê ji dest xwe berdin. bê guman navê we di rûpelên dîrokê de wê bi diwêta gemar û qirêj were nivîsandin. û careke din dê xewneke nû ji nifşên paşerojê re were afirandin bi peymaneke nû û navekî nû.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Fidraliya Serdema Osmaniyan 1514-1850

Bavê Serbest

Ji Xalên Wê Yên Giring: Xweserî û azadiya mîrekên Kurdistanê bi giştî her yek li herêma xwe bi tevdîrek xwecehî.

Piştî biserketina şah Sima`îlê Sefewî ku ew ji neviyên şêx Sefîeldînê Erdebîlî bû, ev malbat navdar bûn bi olperestiya xwe û kîşeya wan ya şî`î (mezheb) ku ceng û destelatiya wî ji herêma Ermênya dest pê kir ta giha Îraqa Ecemî - Xozistan – Faris – herêm li pey herêmê desteser kirin û piştî salekê berê xwe da Kurdistanê herêma Amidê û ji ber ku bi mezhebê xwe Sunî bûn şerekî dijwar di gel wan de bikaranî, zordarî, kuştin, serjêkirin, û talan û tevlî ku 10 mîrekan ji birêvebirên herêmê piştgirya xwe jê re nîşan dan lê bi wan û behwer nebû tev de girtin û zindan kirin ku yek ji mîrekan (Melek Xelîl) bû mîrê bajarê Hesen Kêfê ku hevjînê xûşka şah Sima`îl bi xwe bû, ji malbata Selaheldînê Eyûbî bû, sê salan li girtîgeha tebrîzê girtî man, û ji dêlva wan qizilbaş danîn ta şerê Çaldîranê yê navdar ku di sala 1514 dan de qewimî û di encamê de ew suhun û çavsoriya şah Simaî'lê Sefewî şikest çawa pilan û hewildana wî ku dixwest hemî navçe û herêmên Kurdistanê ên ji 46 mîrên netewî pêk dihat û qizilbaşên şî`î li şûna wan bicîwar bike, lê ev siyaseta bed û çewt pê re neçû serî bi saya hişmendî û zanebûna Şêx Hekîm El- dîn, Îdrîsê Bedlîsî, wê hingê Tirkan bi serpereştiya Sultan Selîmê Osmanî siyasetek derheqa Kurdan de karanîn vacî ya şah sima`îlê Sefewî çawa bi rêberya Şêx Îdrîsê Bedlîsî pêwendî bi hemû mîr, axa, û beglerên Kurdistanê re kirin û pêwendiyên wan ji Şêx Îdrîsê Bedlîsî nehatin birîn û handana wan ji Kurdan ve dijî şah Sima`îl dagir kirin tev de bi saya vê rêkevtinê ku di pê re bû peyman ku di navbera şêx Îdrîs û Sultan Selîmê Osmanî de mohir û emze bû naveroka peymanê ji 5 xalên sereke pêk dihat ew jî ev in:

1- Xweserî û azadiya mîrên Kurdistanê bi giştî her yek li herêma xwe bi tevadîrek xwecehî.

2- Ji mafê her mîrekî ye kurê xwe li şûna xwe destnîşan bike an hinin din çawa bixwaze.

3- Kurd di tevaya şeran de, bi Kurdan re alîkar bin.

4- Di hemû şerên dijminên derveyî welêt, Tirk bi Kurdan re alîkar bin.

5- Kurd bêş û camêryê ji paytextê re rêkin, her sal wek zagonên dewletê tên bikaranîn.

lê mixabin ev peyman piştî 15 salan ji alyê Sultanê Osmanî re binpê bû û sal bi sal pilanên xapînok derheqa Kurdan de hatin bikaranîn. Di vê derbarê de dîroknasê Tirk Olya Çelebî dibêje: Ji sala 1666 an de, waliyê Wanê yê Tirk bi tundî êrîş bir ser Ebdal Xan, mîrê Bedlîsê tev destser kir, mal û berhemên Ebdal Xan tev talan kirin ku ew bixwe Bavpîrê Şerefxanê Bedlîsê bû ji bilî zêr û pera pirtûkxana wî ji barê heft "devan" pêk dihat tev de di warê ziman, ol, noşdarî, nexşe, helbest, dîrok û dîwan piraniya wan pirtûkan bi qab û qewlikên firincî xemilandî bûn ji wan 76 pirtûk û 105 name bi zimanê Erebî û ji Farisî tomarkirî bûn, wî bi tenê bîn ji afrandina mîr Ebdal bûn, û bi van pilan û fêzên çewt herêm li pey herêmê desteserkirin ta sala 1850î herêma Bohtan ku keleha dawî bû ji 46 herêman hate destesrkirin bi hêvî me ku Kurd ji dîrokê sude wergirin haydarî faq û davên neyar bin.

Ziman Nasnameya Gelan e

Ger Em Ji Dayika Xwe Hes Dikin Pêwîst e Ku Em Bi Zimanê Wê Baxivin

Elî Roj

Di vê gerdûnê de û li ser vê xaka pehin û dirêj, her zindiyekî xwedî zimanekî xwe yê cuda heye û ew ziman jî jê re tê gotin zimanê dayikê. Ji ber ku her dayikekî zarokên xwe bi rengekî azad aniye ser rûyê vê dunyayê. Ji lewra mirov jî mîna her zindiyekî ku li ser rûyê vê xakê û di vê cîhanê de jiyan dike, wê zimanekî wî jî hebe. Wê gavê mirov dikare bibêje ku serdema derketin û pêşketina ziman bi serê xwe ji bona mirovahiyê mîna şoreşekî bêhempabû. Ji ber ku bi rêya ziman mirov hîn bêtir ji hevdû agahdar dibe û hîn bêtir bi rêya ziman pêzanînên xwe li ser gerdûn, cîhan, mirovatî û ji her tiştê ku li derdorê wî peyda dibe û diqewime hayî ldibe. Ji lewre dema ku mirov ji dayik dibe û çavê xwe li dunyayê bel dike, ji dayika xwe fêrî ziman dibe û bi rêya dayika xwe roj bi roj hîn bêtir pêzanînên wî pêş dikevin û têgihiştina wî ya ziman pêş de diçe. Ji bona wê zimanê ku mirov di destpêkê de û dema ku çavê xwe li dunyayê pel dike û pê dipeyîve, ji wî zimanî re dibêjin zimanê dayikê.

Ger Em Ji Dayika Xwe Hes Dikin Pêwîst e Ku Em Bi Zimanê Wê Biaxivin

Mirov bi rastî dikare bibêje ku zimanê dayikê pir şêrîn e û ji zimanê dayikê şirîntir tiştek li ser rûyê vê dunyayê nîne. Lê dijmin û neyarên gelê Kurd bi rêya zilm, zordarî, şidet û qirkirina çandî, siyasî û civakî ya ku li ser gelê Kurd dane meşandin û heyanî roja me ya îro jî didine meşandin, rê nedane ku gelê Kurd jî mîna hemû gelê cîhanê bi zimanê xwe yê dayikê û bi rengekî azad bipeyive, bihizire, îfada xwe bike û binvîsîne. Ji ber ku ji her milî ve li ser gelê Kurd û civaka wî qirkirinekî bi giştî û ji her milî ve tê bi rê ve meşandin heye û bi dirêjiya dîrokê ev siyaseta qirkirinê ji milê neyar û dagerkerên ku desthilatiya xwe li ser Kurdistanê dine meşandin û heyanî roja me ya îro jî bi hemû lez û şideta xwe tê berdewamkirin.

Ji bona vê yekê di vê rêyê de û ji bona vê tekoşînê, bi hezarê rewşenbîr, nivîskar û rojnemevan hatin girtin û qetilkirin û gelek kovar û rojname jî hatin girtin. Ev siyaseta qirkirina çandî, siyasî û civakî bi rengekî rêk û pêk li her çar parçên Kurdistanê û bi rêya hêzên serdestî Kurdistanê birêve dihate meşandin û heyanî roja me ya îro jî tê meşandin. Lê mirov dikare bibêje ku tekoşîna gelê Kurd li beramberî van hemû êrîş û qirkirinên ku dihatin jiyankirin û berxwedana ku gelê Kurdistanê dayî nîşandayîn bi xwe re zimanê Kurdî zindî hişt û anî heyanî van rojê ku em tê de jiyan dikin. Ji ber ku gelek zimanê din jî mîna zimanê Kurdî rastî şidet û qirkirinê hatin, lê ji holê hatin rakirin. Lê zimanê Kurdî mîna zimanekî kevnar yê Mezopotamiya û mîna celebek ji celebê zimanê Arî li beramberî qirkirinê hîn li ber xwe dide, ev berxwedana bêhempa ya ku tê meşandin bi xwe re gelek guhertin û veguhertinên mezin di civaka gelê Kurd de da avakirin. Angu gotin li cî be, mirov dikare bibêje ku ev yek bi serê xwe mîna şoreşekî bû û em bi vê şoreşê gihiştin van rojan.

Mirovê Bê Ziman Bê Nasname Ye

Lê av nayê wê watê ku zimanê Kurdî di astekî pir baş de ye, ji ber ku hîn gelek qadên zanistê li holê hene, lê zimanê Kurdî di wan qadan de nayê bikaranîn, ev ji milekî ve, ji milekî din ve mirov dikare bibêje asta xwendin, axeftin û nivîsandina bi zimanê Kurdî hîn lawaz e. Ji ber ku hîn bandora zimanê Tirkî, Farisî, Erebî li ser civaka gelê Kurd di astekî bilind de ye û tekoşîna ku li beramberî qirkirina zimanê Kurdî herçiqasî ku di astekî pêş de be jî; lê di serî de û ji bona qelskirina bandora van zimanê ku me destnîşandayî pêk were û zimanê Kurdî di her qadê de bi bandor bibe û pêş bikeve, pêwîst e ku her malek bibe dibistanek û her mirovê ji dayik, çand, dîrok, welat û azadiyê hes bike, bi zimanê xwe bipeyîve, bixwîne û binvîsîne û xwe ji bin bandora qirkirina ku li ser civak, çand û zimaê me tê meşandin rizgar bike.

Ji ber ku herçiqasî asta berxwedan û tekoşîna li beramberî civaka gelê Kurd bi hêz be, bi qasî wê hîn bêtir zimanê Kurdî pêş bikeve û wê xwe ji pêla qirkirin û wendabûnê rizgar bike. Ji lewra pêwîst e ku em li benda dijmin nemînin heyanî ku dibistanan ji me re veke, an jî bi qenalê telfizyonên mîna TRT6 ên ku tê de şev û roj dîrok, çand û rastiya civaka me berovajî dike. Ji ber ku dijminê gelê Kurd li her derî bi hewildanê xwe yê qirêj dixwazin ziman, çand û dîroka gelê Kurd bihelînin û ji holê rakin, ji bona vê yekê çi ji destê wan tê dikin û heyanî îro bi sedê mirovan hatine girtin, ji bo ku bi zimanê Kurdî peyîvîne, an jî bi Kurdî nivîsandine û bi Kurdî stran gotine. Angu mirov dikare bibêje pêwîst e em di serî de li beramberî van hemû êrîşên ku li beramberî gelê me têne meşandin li ber xwe bidin û her mirovekî ku ji xwe re dibêje ez Kurd im, pêwîst e ku li cewherê Kurdîtiya xwe bizivire, bi zimanê xwe bipeyîve û li zimanê xwe xwedî derkeve. Ji ber ku "ziman nasname û rometa gelan e." û mirovê bê ziman, mîna dara pê pelçem û teyrê bê bask e.

Parastin û Pêşxistina Zimanê Dayikê Erka Me Tevan e

Li beramberî vê yekê, erk û xebata ku dikeve ser milê ciwanê Kurd, ew e ku di her qadên jiyanê de û di serî de li beramberî hemû êrîşên çandî, siyasî û civakî yên ku li beramberî gelê Kurd têne meşandin hişyar bin û mîna hemû xebatên heyî cihê xwe di pêşengtiya tekoşînê de bigre. Di serî de xebatên ramyarî, siyasî û xebatên girêdayî pêşxistina zimanê Kurdî û serhildanên gelerî ji bona avakirina civakeke xweser û demuqrat. Ji ber ku dijminê ku li beramberî me tekoşînê dide meşandin ji bilî zimanê şer û şidetê tiştekî din tênagihêje. Li pêşya me jî tenê rêya azadiyê ew e ku em li ber xwe bidin û xwe di her warê jiyanî de bi tevger û rêxistin bikin, ev yek jî anceq bi rêya xwegihandina avakirina civakeke xweser û azad pêk were. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku em di vê demê de ji hemû deman hîn bêtir nêzî vê yekê ne. Lê ji bona gihiştin û pêkanîna vî armencî, di serî de pêwîst e ku ciwanê Kurd xwe ji bona rojên giran û dijwar amide bikin û di her warî de rêxistin û hevgirtina xwe saxlem bikin. Ji ber ku ciwan pêşeroja gelan e û gelê ku ciwanê wî bi tevger û rêxistinkirî bin û di her warê jiyanê de xwedî fikir, reman û zanebûn bin, tu tişt nikare li pêşiya azadiya wî gelî bibe asteng. Di encamê de mirov dikare bibêje ku hêza ciwanên kurd roj bi roj birengekî ber bi çav derdikeve holê û li her deverî xwe bi bandora dike, ji qadên siyasî bigre û heyanî qadên tevgerî û xwepêşandanên ku li hemberî recîma serdest têne meşandin. Lê di vê demê de ya herî giring ew ku ciwanên Kurd xwe di her qadî de bi tevger bikin û hebûna xwe bi rengekî hîn baştir biparêzin û li hemû qadên tekoşîn û xebatê pêşengiya civakê bikin. Ji ber ku erk û xebatên ku dikevin li ser milê ciwanan ji hemû beşên civakê girantir e û pêşeroja civakê bi destê ciwanan tê xuyakirin û ew wê pêşerojê bi destê xwe xêz dikin. Gelê Kurd jî di dirêjiya dîroka xwe de bi hezarê şehîdan di vî warî de daye û hîn jî dike. Ala şehîdan jî îro di destê ciwanan de ye. Ji ber vê yekê geleke her ciwanekî Kurd bi vê berbirsyariyê bihese û xwe li gorî vê yekê ji bona rojên şer, ceng û tekoşînê hazir û amide bike.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Li Bakurê Dil Bûm

Kawa Şêxê

Careke din mîna xewnên xweş ên berê sibehê. dema ku mirov şiyar dibe lê pir dixwaze careke din razê da ku li wê xewnê vegere. careke din min berê xwe da Ameda rengîn..

Pir caran berî niha çûme Amedê lê. her car jî mîna ku yekem car be şa dibim.

Dema ku berê xwe didim Amedê her car û berî her tiştî wekû çawa mirovê ku biçe Parîsê li Ayfelê difikire. an jî mirovê ku biçe Mirsê li Peramîdên difikire ez jî dema ku berê min dikeve Amedê de zindana wê tê bîra min..

Dizanim ku zindan û kelecan û şabûn li hev nakin. lê zindana Amedê bo min devera herî ku bala min dikşîne di dinyê de.. Erê. erê di dinyê de..

Ez zarok bûm nû hînî xwendina erebî bubûm. bavê min pirtûkek anî malê. pirtûkek çapa wê ne baş bû. qapa wê sor û spî bû û wêneyê kesekî ku di êşkencê de ye li ser hatibû resimandin..

Navê pirstûkê (Salixdanên Kesên Ji Zindana Amedê Rizgar Bûbe) bû..

Dema min ew pirtûk bi tirseke mezin xwend. ket nava hişê min de û nema derket..

Sal derbas bûn û gelek şevan min di xewna xwe de ew kesên girtiyên wê zindanê di xewana xwe de dîtin û bi tirs vediciniqîn û şiyar dibûm..

Niha û piştî ewqase sal û ewqase qaşo guhertin. dîsa jî her ku diçi. Amedê pêşî di zindana wê de difikirim. paşê jî di xweşî û jjiyana kesên wê de..

Pir caran dixwazim li kolanên Amedê xelkê rawestînim û ji wan re çîroka xwe û wê pirtûkê bibêjim. lê ji xwe re dibêjim ma tiştekî wisa dibe. ev xelkê Amedê ne. ew ji min bêtir van çîrokan dizanin..

Li Amedê pêrgî pêxwasên Amedê dibim. xwe jî yekî ji wan dibînim dema di şert û mercên mezinbûna wan de mijûl dibim..

Li Amedê panzêr û polîsan dibînim û di dilê xwe de xebaran ji wan re didim..

Li Amedê li ber deriyê firinên nan. mîna ku li Qamişlo û Hewlêrê bim. dazikên Kurd li ber derî rûniştîne. nanê xwe sar dikin û bi jinên hevalên xwe re dikevin nava galgal û qerfan de..

Carna jî di nava wan rûniştandina dayikan de dengê telefona yekê ji wan tê. û dema ku vedigerîne bi şerim bi Tirkiyek şikestî dibêje ez li firnê me kurê min. waye têm..

Diçim Amedê û tenê hêviya min ew e ku careke din bêhina Dayik û bavê xwe. bêhina Qamişlo û Efrînê jê bikim..

Amed gelek xwestekên min bi cî tîne. lê tirsa di nava dilê min de jî zêde dike..

Dema li Amed li şaredariyê dibim mêvan. pirtûkxaneya wê ya Kurdî. jiyana hestên Kurdî tê de dibînim. pir ditirsim ji wendakirinê..

Erê. erê ji wendakirina van tiştan pir ditirsim..

Amed mîna keçek xweşik be her kes lê dinere. ez bi tirs im ku careke din bi dû xerşban bikeve û bi wan re here..

AKP. Cemaetên Islamî. MHP. û nijadperestên tên Tirk li Amedê hene û ne hindik in..

Ji hebûna wan li vir ser Amedê ditirsim. ji hebûna pereyên wan li ser wijdanê belengaz û feqîran ditirsim û ji hebûna hêza wan li ser dilê tirsok û perîşanan ditirsim. û tunebûna mirovantiyê li ba wan li ser kesên mirovantiya wan kêm ditirsim..

Amed mîna sûra xwe kevnar û xurt e. lê di hin devera de şikestî û birîndar e..

Bejna Amedê bilind û xweşik e lê kêlek wê ji dijminan re vekiriye..

Dibe ku kîjan rojê be jî Amed careke din ber bi serdemên tarî ve biherike. tirsa Amedê nema ji dijmin û polîsan e vê carê jî tirsa Amedê ji xelkên wê yên ku zû zilma salan jibîr kirin. yên ku bi dû bercewndiyên xwe ketin û yên ku ji dijmin bawer kirin..

Li Amedê hin kes hene nizanin ku di nava vî bajarê de hîna girtîgeha ku wekê keleha zilmê tê naskirin hîn li dar e û hîna jî tijî xort û ciwanên Kurd ên azadîxwaz in..

Û Hin kes hene nizanin ku di zindana Amedê de ew kesên ku rewş guhertin hîna têne ragirtin..

Hin kes li Amedê dijîn. lê nizanin ku ji hucreyên wê zindanê hîna vedengê şivanekî ku stranan li ser çavên dîlbera xwe dibêje tê..

Lê her kes li wir dizane ku dema di 21ê Adarê de bêhna şewatê radibe. dizanin ku behna hêrsa Mazlûm e. ku dîwarên zindana tarî ji ber disincirin û alavên agirê wî serê çiyayê Kurdistanê Ronî dikin..

Komînistên Jêrzemîna û Komînistên Modêl

Ew azadiya jinê dipejirîne lê di heman demê de ola wî ya nû şûkirina ji 4 jinan dipejirîne, ew wekheviyê dipejirîne lê di dema belavkirina mîrateya bavê û dayika xwe cudahiyê dixe navbera jin û mêr (xwişk û bira), ew şoreşger e lê bawer dike ku her tişt li ser eniya wî nivîsandiye!

Şêrko Ebdulrehman

Di salên şêstî ji sedsala bûrî de ramanên komînîst bûbû modêl». Jişêstîûşûndeçanda komînîstan belav bibû mîna her modêlekê. çawa modêla porê dirêj û şerwalên şelisto di salên heftê de. modêla gumlekên gulgulî û gumlekên sade. lewma pir kes bûne komînîst. ne ku ew kes bi çanda komînal bawer bûn û doza hevkariyê û wekheviyê dikirin. na ne wisa bû. Ew kes li gorî modêla serdema xwe tev digeriyan. Kesên ku xwedî li ramanên komînîstan dernediketin weke mirovên paşverû dihatin dîtin. Ger ku ev pêşgotin baş wer fêmkirin em dikarin aloziya fikrî ya destpêka vê sedsalê fêm bikin. alozî ew e ku piraniya kesên qaşo komînist bûn anha di xeta sofiyan de ne. her wiha jî hin ji wan bi awayekî hişk bûne oldar. di nêrîna min de ev serbestiyeke ramanî ye. çimkî her kes mafdar e ku nêrîn. raman. ol. cil û teşeya xwe biguhere. Lê tiştê nayê pejirandin ku ew kesên qaşo di xeta pêşverûtiyê de bûn bikevin nava xeta sofî û oldarên hişk ên ku ji bilî xwe ti kesî napejirînin.

Ev dem dema hev û dû pejirandin û qebûlkirin e. ev serdema ku her kes dijberên xwe qebûl bike. Lewra pêwîst e her kes nêrîn û ramanên cuda qebûl bike û bipejirîne.

Li ser vê yekê ez dibêjim ku ew kesên ku anha ti kesî ji xeynî xwe qebûl nakin ew di salên heftê û heştê de; pêşverûtî û komînistî weke model dipejirandin. ji ber ku komînistên ji dil û can di jêrzemînan de bûn her wiha bi awayekî veşartî xebata xwe bi rê ve dibirin. lê piştre bû modêl û nîşana hişê vekirî. Mijara min ew in komînistên modêl ne komînistên jêrzemînan. Ji destpêka vê sedsalê guherînên pir mezin di kesayetên mirovan hate belîkirin ji ber ku gelek nirx û sembol hatin hilweşandin û valahiyek giyanî derket holê lewma pir kes berê xwe dan sofîtiyê yan jî oldariya hişk û ziwa piraniya van kesan jî komînist bûn» Û ev çîna biçûk a hatî guherîn bûye barekî giran li ser milê vê civakê çimkî nakokiyan di nava xwe hilgirtine mîna zordarî û dadmendî. şoreşgerî û teslîmbûn. azadî û koletî. wekhevî û newekhevî.

Birastî ez pir zehmetiyê bi van kesan re dikişînim çimkî mirov nizane dê çawa diylogê ligel wî bike. li ser çi bingehê û bi kîjan awayî. Ew azadiya jinê dipejirîne lê di heman demê de ola wî ya nû şûkirina ji 4 jinan dipejirîne. ew wekheviyê dipejirîne lê di dema belavkirina mîrateya bavê û dayika xwe cudahiyê dixe navbera jin û mêr (xwişk û bira). ew şoreşger e lê bawer dike ku her tişt li ser eniya wî nivîsandiye»

Ev yek ji nexweşiyên civaka me ye tenê dem û azadî dikarin şîfayekê jê re peyda bike. Ji ber ku bi demê re pêşketin tê û bi azadiyê re her kes dikare ramanên xwe hilbijêre bêyî bandora zexta civakê. saziyên olî û zordariya desthilatdariyê.

Tiştên Ku Ji Şîr Tên Çêkirin

Luqman Silêman

Ew dibe çortan.

Wî çortanî dihilênin zivistanê û careke dî wî têxin dew û pê mehîrê çê dikin.

Lê dema ku bixwaze şîrê xwe bike penîr wê çi bike?

Wê şîrê xwe cemidî firşik bike. Firşikê penîr ji çi ye? Berx yan kehir ew ê ku hîn giya nexwarine. Gerek yekî serjêkin berçîçeqa wî derxin û wê li cîkî hilînin ta ku ew hişk bibe. Jê re dibêjin firşik.

Wê êvarî pîreka malê şîrê xwe firşik bike ta serê sibehê. av bi wî penîrî dikeve.

Ew ava penîr dibe çi?

- Dibe şijik (şijik ava penîr û kerengan e yan hin pincarê dî ye)

- Dibe lorik. lorik ava penîr e. dikelînin û dûv re dixin kîsekî paçikî de ta ku ew av didawerive "wek lebnê lê tê".

Piştî ku jina male pezê xwe yan çêleka xwe didoşe. heger ku ew bixwaze wî şîrî bike mast divê şîr deyne ser agir ta ku ew şîr bikele. dûv re ji ser agir deyne ta ku ew şîr hinekî bicemide. wê jin tiliya xwe bixe nav şîr de gerek hinkî destê wê ji wî şîrî bişewite. wê hin mast "Heyvan" bîne berde nav wî şîrî de (çimkî şîr bi mast dimeye). Piştî ku şîrê xwe haveyn kir wê şîrê xwe binixwimîne ta roja dî.

Heger ku mastê xwe bixe dew. wê qeymaxê mast ji ser bigre û wê mastê xwe berde meşkê de û beroşek av jî berde ser wî mastî û dewê xwe bikeyînê ta ku nîvişk bi ser wî mastî bikeve. wê nîvişkê xwe başiqe bixe firaxekî û dewê xwe bixe firaxekî.

Dew dibe çi?

- Dew dibe jajî (jajî dew e û sîr in yan hin pincar e)

- Dibe mehîr. mehîr jî dew e û dan e anku genimê kutayî ye.

- Dibe sipil " jajiyê bê sîrik e".

- Dibe ser dew " hin ava jijikê û hin dew û hinek pincar hûr dikin nav de. dibe serdew. Vê li penîr dikin".

- Dew dibe çrortan. " dew têxin kîsekê paçikî de ta ku ava di nav de jê didawerive ew dew hinkî ziwa dibe û têxin gulokê piçûk û dideynin ber tavê ta ku hişk dibe.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî Mehmûd Sebrî “Evîndarê Xemgîn”

Helbestvan Mehmûd Sebrî Xelat û rêzname ji hêla van navendan wergirtine: Navenda Cegerxwîn li Hesekê – Peymangeha Bedirxan ya Zimanê Kurdî li Dêrikê – Festîvala Helbestê 2010 – Encumena Niştimanî Kurdî. Û li ser dirêjhiya 17 salan di komîta amadekar ya festîvala helbestê de maye.

Helbestin Bijartî ji Dîwana:

DOZA GIRAN Û UMÎD Û XWEZGA YÊN TEVLIHEV

Kepezê Kîkan

Kepez ; her dem.li dîrokê tu ma rêzdar
Bi(Kîkanşên xwe yên dêrîn.tu ma navdar
Bi vî navî.tu hat nasîn.sedên salan
Li çarhawîr te.Kîkan man .xwedî şûnwar
Ser efrazî.li hember kumbeta Mêrdîn
Digel bayê Qerejda'xî.tu ma sozdar
Li hember Kewkebê Millan.tu ma hemta6
Tu çavdêrî.li Xingala gelek kevnar
Tu hevbend bû.digel van cihnişînên Kurd
Li Xabûr û li Zirganê.tu ma xunkar
Tu pêwendbû.bi Girsor1. ta bi Circib11her
Ji Mêrdîn.ta bi Xabûr jî. tu ma serkar
Li çar hawîr te.Kîkan û kesên kurd bûn
Xwedî war bûn.bi çalakî. diman jîndar
Xwedî rûmet.dijîn serbest.li wan waran
Bi azadî.li nav xaka xwe-bûn hîmdar

Mele Mehmûd Sebrî “ Evîndarê Xemgîn” di sala 1937an de li gundê Çetelê yê bi ser bajarê Dirbêsiyê ve ye jidayik bûye. Di zaroktiya xwe de neçûye tu dibistanan, lê 9 salan li ber destê şêx û meleyan xwendiye.

××××××××××××
Cihê Gernas û xweşmêrên xwedî rûmet
Dema îro.tu ket dest rehperestên har
Derî girtin.li ber wan cihnişînên Kurd
Diman bê xak û bê hevbend.û pir naçar
Heçî Kurdên.berê Cihnişîn bûn tev
Perîşan bûn. diman bê kar û pir azar
Ji nêzîk û ji dûr. rûtên 'Ereb anîn
Ji xaka bav û kal an.Kurd kirin bê par
Hezarên rût.ji Reqqayê.'Ereb anîn
Li nav xakê te yê pîroz- kirin zordar
Ji bo rûtên 'Ereb - ava kirin xanî
Dehên gundên mezin-çê bûn.bi xurt biryar
Xwedî konên ji tellîsan- dibûn zengîn:
Xwedî xak û xwedî gundê wekî bajar
Bi şovînî. dij in. bo cihnişînên Kurd
Giran-xwîn û finas pîsin.gelek kîndar
Çima kurtêlxurên rût û li ber pez bûn.
Xwedî xakin?li nik wan .Kurd dibin cotkar:
Serî hilde.Kepez; va roj. li Kurd derket
Gelê da pey xebata dad- dibit rizgar
şikodar bit.bi gorra Berdewîn ê dêw
Li jora kumbetê .aram dibit . bê zar
Ji bîr naçin.çi car.ew Sali'xên pir seyr
Liser gewdê wiyê. pir girs û pir sehmdar
Li nêz .aramgeha can-pak(Qusêrîş.ma
Me.pir caran.bi wê serdangehê-sûndxwar
Li zinnarê te yê jêr. lane ya şêr- ma
Li nêzî wê.cihê şehbaz û hem şinqar
Cihê Newroz û sersalan .tu pîroz ma
Kekên(şêrêş.li çarhawîr te-man pêdar
Tu ma nas-nameya rêzdar.ji bo(Kîkanş
Li dîroka te ya şanaz.dibin guhdar

Xame û Rojnamegerî

Xame serî hilde. bi xurtî. ne bi gazin
Bêje neyar: Em . ji te. mafên xwe dixwazin
Dakeve hola nebezên Kurd.tu nivîskar
Hiş bide pêş.xap lime tên hev.weke bazin
Wan kul û derdên meye kevnar-bide pêş-çav
Ew.li gelê Kurd.biteba- sîne-gudazin
Êş.li civakê me- gihan hev.li me kevn bûn
Maf.bi hejarî ji neyarên xwe.dixwazin
Perçekirî.ma ye welat. çare ne bû.doz
Xwînmij û zorker.li me har bûn.Çi berazin:
Pê li gelê Kurd û li mafên merivên Kurd
Tevde–dikin.peyv xweş .û pîse-finazin
Kêşe giran bû ye .li Kurd.çare ne ket dest
Kone û serdeste neyar.em bi werarê-ne terazin
Lê bi xebat û bi dilê xurt û bi rêzan
Gel digihên maf û umîdan. ne tinazin

××××××××××××
Xên bibe.rojnamegerî;gel bike hişyar
Rêber ûpeyrew weke hev-tevde nesazin
Rapere. rojnamegerî;dakeve nêv gel
Peyv.ji te-rêzdare.hemî şîret û raz in
Geş bibe zû zû.li civaka me ye mandî

Di sala 1961`ê de bawernameya qonaxa amadeyî wergirt û Bekalorya di sala 1965an de, di sala 1966an de bawernameya peymangeha amadekirina mamosteyan wergirt. Û 9 salan mamostayetî kiriye.

Pêş ve diçin em.bi umîdin.bi niyazin
Rabe.hunermend;bide pêş gênc û rewlan
Hilkişe berjor.çikû doz kopik û gaz in
Hilde hewara me ye azad.bike qêrîn
Kêşe û doza me.bi dengin.def û caz in
Xahiye.azadiye.man nêz.ji me kurdan
şadiy û serbestiye.hem saz û newaz in
Hil be.ciwankar; tu bi hêza xweye serdar
Cansivik û şeng be.ciwankar weke baz in
Çak30 bike ayinde. jibo her merivên Kurd
Lê bi dilê xurt nebe.mafên me-nexwazin
××××××××××××
Tore û pêma.li hişên jîr.li nigaşan
Taze ji nû .va ne kulîlk dan. geş û naz in
Mêwe xweşin ew.çi gelek ber digirin
Çak dibe ber.sêv ûbihokin.ne gilazin
Tore û zanîn. li hişên Kurd-dibe iksîr
Tevde dibin zêr.bi buhayê xwe firaz in
Xame;bi serbestiy û zanîn.binivîsin
Derfet û ça'xa weye.Mafên me.bixwazin.

EVÎNA BÊ TIXÛB

Ah ji pêta gûr-evîna daye deng
can û dil herdû. ji wê. bûne pereng
Ez li êrîşa evînê hay ne bûm
wê dema min xwest reha bim. bû dereng
Lerze ket can. hiş ji min rawestiya
têkilî hev mane raman. bûne peng
Can fireh bû. bo evîna bê tixûb
reh li dil berdan. bi jînê maye şeng
Ez ji ber pêtê ne bûm. bê hêz û qels
dil ji dûmana evînê – nabe teng

×××××
Hat girêdan dil. bi nêrîna te. yar
hem ji çavên min. nerîn mane çeleng
Tûj-nerînên her du çavên layzerî
kun kirin dil. bûn birûsk. û bûn xedeng
Peyv û xweş-amajeyên çavên te yar
daketin nava hişê min. heng bi heng
Kehreba rû yê te şewq da. hate dil
pir çirîsk dan. vêketin şewq. reng bi reng
Xweş-hinasa yar. ji nav lêv û deva
bihn û reng geş sor-gulin. her man qeşeng
Dil-nexwaz û dixs. gelek şad bûn li min
wê dema. yar eşkera kir rezm û ceng

Di sala 1959an de destpêka wî bi nivîsê re bû, û destpêka wî bi weşanê re di sala 1985an de bi kovara “Xunav” re bû, û dûv re kovara “Buhar”.

Mane pabend ew. bi kîn û dixsiyê
man girêdayî. bi hevsar û qeleng
Derd. li hawîr dil. gihan hev. lê civîn
dil. ji nav kokên xwe. hil bû. wek kereng
Gazinên dil. ez bi yarê her dikim
derd û êşên dil mezin bûn. bûn neheng
Guh-nedana yar. li min. zor hat gelek
lê nihînên awiran – man dost û meng
Tevgerên dildar. ji yarê bûn xuya
jîn bi min şêrîn kirin. wek qend û keng

×××××
Çend ji dest çûn. doz û daxwazên dilan
ez di gel yara xwe xurtim. bûm leheng
Yar dilovan ma. bi wê ez bawerim
ez bi wê ber jor firîm. bê bask û çeng
Gewz û şadim. ger bi çavên dilberê
bûme dil-kêşê xwedî rêz û gereng
Dil-xweşim. her dem. ji dîdarên te yar
cejn û newrozin. li jîna kût û leng
yar. tu miskî. bihn. li ber çav. naxuyê
lê bi bihna xweş. tu rêzdarî bi seng
Sirwe -bayê hênikî. hest pê dikim
sax dikî can û dilê pir jan û zeng
Yar tu dost. û hem hevala temenî
piştgira çaxên ne saz. û pir wezeng

Komara Kurdistan (li Mihabad)
Mihabadê Tu rêzanî
Te erkê xwe-bi cih anî
Bi komara xwe ya kurdî
Tu bû mizgîn.li her canî
Te ala rûmetê Hilda
Li jora(Çarçira)banî
Te şewq da kurd ûkurdistan
Tu wek roja li 'ezmanî
Sitêr bûn Qadiy û hevrê
Çi şewqdar bûn . ji dûranî:
××××××××××××
Te ser hilda.li hember wan
Kirên bê bext û tawanî
Tu şoreş bû.dijî zordar
Bi hawar û bi halanî
Ji çar hawîr.gihiştin hev
Lehengên Kurd.bi mêranî
Tu peymana gelê kurd bû
Ne Çaldêran û Lozanî
Dijî Saykis. digel Pîko
Tu piştxurt bû .bi Barzanî
××××××××××××
Li Qarawa sedê Kuştî
Ji serbazan13.Xeho danî
Li cenga Mameşah dîsa
Ketin bê can.bi garanî
Sedên dî jî . hemî dîl bûn
Bi riswayî . perîşanî
××××××××××××
Bi xwîna şêr rewanpakan
Çi pîroz bûn.çem û kanî:
Bi wê geş bûn.newal û gaz
Tu xwîna şîn.çi samanî:
Tu ew kurdê Xwedî dozî
Tu renckêş û gelek janî
Bi hêvî bûn .bibin rizgar
Ji bindestan.bi hozanî
Reha bin zû .ji wê zora
Wekî jehra silêmanî
Bi azadî. bi serbestî
Bi jîn wek hêviya(Xanî)
××××××××××××
Mixabin.ew dilêrên şeng
Ku winda bûn.bi dûmanî
Ji ber bê bext û bê hestan
Lipaş ma bûn.bi karwanî
Sedên wek Seyfiy û Sedrî
Ji dest berdan .bi koranî
Dehên wek Pêşewa -can dan
Li sêdaran.bi hêlanî
××××××××××××
Belê dawî li doza kurd
Çi car nayê. bi hêsanî
Tu doza şoreş û xwînê
Tu her dem .gaziy û hanî.

di sala 1970ê de beşê “Hiqûq” li zankoyê bidawî kir, û di salên 71-72an de bawernameya Diplom ji peymangeha pilankirinê a geşpêdana aborî wergirt.

Ji berhemên wî: Nîgarên Kul û Derdên Jiyanê 1997 – Doza Giran 1, û Doza Giran2 2004. 2005 - şîrovekirina 55 helbestên Cizîrî ji du celdan ne 2000 – Hin Ramanên Netewî û Civakî 2000 – Nasnameya Kurdî Li Sûryayê – Cengên Xaçparêzî 2013.

Peyva wendayî

L	Ê	N	Û	S	D	P	P
E	D	I	M	B	E	I	Ê
Z	E	W	A	R	T	R	N
M	P	A	S	Ê	S	T	Û
Û	R	N	E	Z	O	Û	S
N	E	E	I	S	M	K	P
T	Ş	P	O	L	A	A	E
J	Ê	B	I	R	M	N	L

Ezmûn, depreş, mamoste, lênûs, pênûs, wane, jêbir, mase, rêz, pirtûk, pel, pol.
Peyva wendayî ji 8 tîpan e, navê xwendegehê

Bersiva peyva wendayî 42: "Bihar"

Pendên Kurdî

- Her gel kesê te bigrîne ne kesê te bikenîne.
- Hesp dibeze, siwar pesnê xwe dide.
- Her kes ji aqlê xwe razî ye, bê aqil bêtir.
- Her kes giriyê wî li miriyê wî tê.
- Heger ker bi nefse kulmek ceh bes e.
- Heger gur ji baranê bitirsya wê ji xwe re kurkek çêkira.
- Heger genim bû firîk malê bik Şirîk.
- Hevalê hevala pir in, lê ne li ba hev in.
- Heta mi xwe nas kir mi malê xwe xelas kir .
- Nizane quloçê du bizna ji hev veke.

Tê Çawa Ji Qelewbûnê Xilas Bibe

Eger hûn li rêyekê digerin da ku bikarin bi bê vegera li dermanên zeîfbûnê yan sîstema xwarinê ya zehmet ji qelewiya qalçê (ranê) û zikê xwe xilas bibin vê şerbeta nû ji bo bedenek bedew bikar bînin.

Pêkhate:

Tasek ava kelandî

Kevçiyek qaşirê lêmonê yê hûrkirî

2 Kevçiyên ava lêmonê

Kevçiyek darçîn ya hûrkirî

Nîv kevçî hingiv

Rêya amadekirinê:

Hemû wan pêkhateyan baş tevlî hev bikin û 10 deqîqeyan bihêlin. Piştre bi sûzakê şerbeta wê paqij bikin.

Her weha wê şerbetê berya xewê bi 3 demjimêran û berya taştiya sibehê bi nîv demjimêrî heya mehekê vexwin.



Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	■							
2							■	
3					■			■
4						■		
5		■					■	
6			■					
7								■
8	■			■			■	

Asoyî:

1- Çol (vajî).
2- Straneke Ciwan Haco.
3- Nasnavê Beko, bi lez.
4- Welatekî Ereban, wekhev.
5- Karê xêrê (vajî).
6- Endamekî laş, leşker.
7- Pilêta kesane.
8- Dawiya heftiyê (vajî), daçek.

Sitûnî:

1- Berhemeke daran.
2- Ew e – gelekjimarî-(vajî), endamekî laş.
3- Bêdengî, aliyê ku roj lê nade.
4- şêweyê bankirinê.
5- Vexwarinek e, ji asîman dibare (vajî).
6- Sewala bêkêr, timb (belawela).
7- Amûreke mûzîkê, dengdêr.
8- Hewa, Kêfxweş (vajî).

Bersiva Xacerez42

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	■	N	A	B	A	Y	e	B
2	Z	I	R	A	V	Ê	■	A
3	E	W	A	N	■	Z	Û	■
4	Y	E	M	E	N	■	D	D
5	T	■	Î	Ş	A	B	■	A
6	Û	R	■	A	R	T	Ê	Ş
7	N	A	S	N	A	M	E	■
8	■	N	Î	■	B	I	■	A